Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar :1239 · 15-Çile-2025 · www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Vejînkirina rihê afrandinê li cem xwendekaran

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

**Mamosteyê Zanîngeha Rojava beşê wergerê Elî El- elî diyar kir ku ev ferheng ji bo xwendekarên zanîngehê gaveke serkeftiye. Armanca me vejînkirina rihê afrandinê ye li cem xwendekaran.**




Xwendekarên Zanîngeha Rojava beşê wergerê yên sala 2'emîn ku ji du refan pêk tên refek wergera kurdî-ingilîzê ye ku ji 18 xwendekaran pêk tê ferhengeka bi navê Arî amadekirin. Refa din jî ya wergera Erebî-ingilîzî ye nêzî 22 xwendekarî ne ferhengeka bi navê Wordspire amade kirin. Ferheng ji 1000 Peyvî pêk tê, di nava xwe de hemwate, pênase û mînak li ser her peyvekê digre.


Di derbarê amadekirina xwendekarên beşê wergerê ji ferhengan re mamosteyê Zanîngeha Rojava beşê wergerê Elî El- elî ji Rojnameya me re axivî.

### Karê xwendekaran hêviyê dide

Elî EL-elî da zanîn ku wergervanên kurd pirsgirêka wergerê dibînin ku jêder nînin ku li gor wê wergerê bikin û wiha got: "Lewma me xwest em ji milê xwendekaran ve dest pê bikin ku wek hêviyekê bidin wergerên mezin ku em dikarin pirojeyeke wilo bidest bixin. Ku di demên pêş de berhemek hebe ku em hemû wek çavkanî bibînin. Bi giştî dema ku bi me re xwarî heya ku me ev ferheng bidawî kirin 2 meh bûn. Ferheng ji 1000 peyvên ingilîzî pêk tê, ku ev peyv yên herî zêde tên bikaranîn. Ev karê ku xwendekaran kirî karekî pîroz û nûye, ji ber ku ferhengên ji kurdî- ingilîzî hene lê ev ferheng ingilîzî-kurdî ye. Ev ferheng me ji bo kesên biyanî çêkiriye dema werin serlêdana bajar bikin hin têgeh hebin û bixwazin fêr bibin, wê ev ferheng bi wan re bibe alîkar. Her wiha gelek gotûgot derketin ku tevî hindikbûna peyvên wê û navê ferhengê lê hatiye kirin. Armanca me jê ew e ku wek gavek pêşiyê 1000 peyv bin, lê mebesta me jê ew e di demên pêş de xwendekar wê bi berdewamî ferhengê pêş bixin û mezintir bikin. Astengiya ku rastî me dihat me ji bo xwe kir ev ferheng, astengiya me ew bû ku jêderên me nînin me ev ferheng çêkir da ku bibe jêder. Gelek ferheng hebûn wateyê tam nedidan yan jî gelek şaşîtiyên rêziman di wan de hebûn, loma me lêgerîn û hewildanên xwe kirin ku em vê gavê bavêjin. Tişta herî baş ew bû ku xwendekarên me ji hemû beşên Rojavayê kurdistanê bûn, angu ji hemû devokan bûn û peyvên kurdî yên resen bikar anîn."

Mamosteyê Zanîngeha Rojava beşê wergerê Elî El- elî dawî li axaftinên xwe anîn û wiha got: "Ev ferheng wek destpêkekiye ji pirojeyek mezintirre, mebesta me ew e ku jêderek çêbibe ji giştî wergerên kurdî-ingilîzî re da ku hewcedarî ferhengên din nebe. Raste ji cem me xebat dest pê kir, lê li kîjan welatî bidawî bibe ne pirsgirêke. Hêviya me ew e ku asta zanistî li zanîngeha Rojava pêşbikeve ji ber ku heger di zanîngehê de zanist pêş ket wê Rojava bigiştî jî pêşbikeve. Her wiha daxwaza me ewe ku em ji fêrkirinê ber bi afirandinê ve herin, ev metiryala ferhengê di salên çûyî de hinekî astengî têde dihat kişandin. Lê ji îro û şûnde em ê şêwazekî cûda bikar bînin gelo heta çi astê ev xwendekar dikare bi riya vê xwendinê re biafirîne."




## Bi kamîreya Narama Mihemed



# Klîba taybet a ji bo Sakîne Cansiz



**Tevgera Çanda Jinan a Kevana Zêrîn, bi sedema 12'emîn salvegera şehadeta damezrînera PKK'ê û pêşenga Tevgera Jinên Kurd Sakîne Cansiz, klîbek bi navê 'Sakînayê' çêkir û cara yekê bi NUJINHA'yê re parve kir.**

Tevgera Çanda Jinan a Kevana Zêrîn, bi sedema 12'emîn salvegera şehadeta yek ji damezrînerên PKK'ê û pêşenga Tevgera Jinên Kurd Sakîne Cansiz, klîbek bi navê 'Sakînayê' çêkir û cara yekê bi NUJINHA'yê re parve kir.

Gotin û awazê strana bi navê 'Sakînayê', ji aliyê Sîdar Amed ve hatine amadekirin. Klîba stranê jî ji aliyê Feraşîn Demhat ve hatin çêkirin. Aranje û mîksa wê ji aliyê Xwezan Harûn, saz ji aliyê Mordem Firat, gîtar ji aliyê Varon Candemîr ve hatin lêxistin. Xwezan Harûn û Mordem Firat bi hev re vokaltiya stranê kirin.

### 'Heval Sara efsûna jiyana şoreşger e'

Sîdar Amed ê ku stranê dibêje, diyar kir ku gava gotinên stranê nivîsiye gelek tengasî kişandiye, ji ber ku nikaribûye Sakîne Cansiz bi gotinan bîne ziman. Sîdar Amed wiha got: "Gava destpêkê min Heval Sara nas kir, liv û tevgerên wê, sekna wê ya bi displîn, bandorek mezin li min kirin. Min ji xwe re got ku 'cewhera xwe ji Rojê girtiye' û ev yek bûye sedem ku xweşiktir û bi heybettir bibe. Min ev stran, wek deyneke rêhevaltiyê nivîsand. Hemû jin, mêr, her kesên ku heval Sara nas dikin, pêwîst e behsa wê bikin. Heval Sara, efsûna jiyana şoreşger e."

## FERHENGA BIWÊJAN

**Sed kum bêxwedî dimînin:**
- Heta hingê kî sax e kî miriye.

**Sed kum bêserî dimînin:**
- Bi heman wateyê.

**Te tîr kir te rohn kir?**
- Te çareser kir yan te kir girêk?

**Tovê belkî hê şîn nebûye:**
- Bi belkî, bi ihtimalan em nikarin tev bigerin; em nikarin xwe bi hêviya tiştên nediyar ve bihêlin.

**Weke mar e, ne cih e ne war e:**
- Kengê bi kû ve diçe ne diyar e; ti kes nizane ka bi kû ve diçe.

### LI SER DESTÛR Û SERBESTKIRINÊ

**Benê wî sist kir:**
- Rê jê re vekir; destûr dayê; çavê xwe ji re girt.

**Çavê xwe jê re digire:**
- Serbest kiriye; dengê xwe ji kirinên wî re nake.

**Destê xwe ji ser rakir:**
- Serbest kir.

**Rê dayê:**
- Destûr dayê.

**Rê jê re vekir:**
- Destûr dayê ku biçe mala wî biçe serdana wî.

**Riya mala xwe jê re vekir:**
- Bi heman wateyê.

**Riya malê xwest:**
- Destûr xwest; ji bo çûna mala wî xwest destûrê bidiyê.

**Riya mala xwe da me:**
- Destûra çûna mala xwe da me. Got; hûn dikarin werin.

**Serî jê re berdaye:**
- Serbest kiriye; çi dike tevlî karê wî nabe.

### LI SER NEZANÎNÊ

**Ber xwe nabîne:**
- Xeşîm e; nezan e; bi kêrî xwe nayê.

**Bûye destikê wî:**
- Ji bo wî dixebite; di karê wî de ye; bi gotina wî radibe rûdine.

**Bûye dûvikê wî/bûye dûvelanikê wî:**
- Weke wî dike; bi gotinên wî dike; ew bixwe bêbiryar e.

**Bizin firot bi heftan, bezê wê kirî bi heştan:**
- Ji bo kesên ji nezanîna xwe zererê dibînin tê gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Şehadeta Xebat Dêrik bû nexşeriya Şoreşa Rojavayê Kurdistanê



Birayê Şehîd Xebat Dêrik, Hisên Mihemed Remedan da diyarkirin ku şehadeta Xebat Dêrik hîma şoreşgeriyê di civakê de ava kiribû û wiha got: "Xebat Dêrik ne tenê birayê me bû, di heman demê de mamoste û fermandarê jiyana me jî bû."**R-6**


# 'Bi ruhê Şerê Gelê Şoreşgerî em ê parastina axa xwe bikin'



Dayîkên bajarê Qamişlo diyar kirin ku ew ê heta dawiyê parastina axa xwe bikin û wiha gotin: "Pêwîste her kes bi ruhê Şerê Gelê Şorşgerî dakevin meyidanê û parastina axa xwe bikin."**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar : 1239 · 15-Çile-2025 · www.ronahi.net/ku/ · Nirx: 500 L.S

# Îmralî çareseriya aloziyên Rojhilata Navîn e



Rojnamevan Stêrk Gulo bal kişand ser girîngiya hevdîtinên DEM Partî bi Rêber Apo re û wiha got: "Îmraliyê kilîta pirsgirêkên Rojhilata Navîn e, eger ew çareser bibe wê pirsgirêkên Rojhilata Navîn jî çareser bibin."**R-5**

# Hişmendiya netew-dewlet pirsgirêkên Tirkiyê kûrtir dike



Rojnamevan Nîhat Kaya, helwesta dagirkeriya Tirk ya ragihandina şerê taybet li hemberî hevdîtinên Rêber Apo rexne kir û wiha got: "Aloziyên li Rojhilata Navîn, bi taybet li Sûriyê bi riya gurkirina hestên netewperestiyê û hewildanên valaderxistina aştî û demokrasiyê ne. Dagirkeriya Tirk jî bi riya ragihandina şerê taybet vê yekê pêk tîne."**R-4**

# LI TIŞRÎNÊ BI GURZÊ RUSTEMÊ ZAL ŞEREKÎ EFSÛNÎ TÊ MEŞANDIN

Li dijî planên dagirkeriyê şervanên YPJ, YPG û Meclisa Leşkerî ya Minbicê li Bendava Tişrînê bûne Kawayê Hesinkar û Rustemê Zal ên serdemî. Herwiha bi coşeke xurt ev şerê rewa ji bo parastina gelan tê kirin û gel jî li bendava Tişrînê bûne şahidê vê berxwedaniyê.**R-3**



# 'Çand û Hunera Şoreşgerî bi Tevgera Azadiyê re dest pê kir'



Lêkolînerê hunerê Serhed Zana diyar kir ku çand û huner di cewherê xwe de şoreşgeriye, lê sîstemên desthilatdar ew veguhertine bazirganiyê û got, "Temenê Çand û Hunera Şoreşgerî bi Tevgera Azadiyê re hatiye destpêkirin. Di vî temenî de bi hezaran berhem û bi 100'an berdêlên giranbuha hatin dayîn."**R-7**

**Jinan li Sûriyê dest bi pêvajoyeke nû kirin** — Nehîr pale R-2


**Berxwedana Bendava Tişrîn û Qereqozaqê!** — Dilyar Cizîrî R-4


**Pêvajoya Aştiyê** — Farûk Sakik R-5

**Yên ku hêza wan nîn be, nikarin aştiyê pêk bînin** — Zekî Bedran R-5

# ‘Pêwîste jin bi destê xwe mafê xwe binivîse’

Endama Rêveber a Meclisa Jinên Sûrî Erîfa Bekir diyar kir ku hikumeta demkî ya Sûriyê dixwaze jinê vegerînin bin perdeya cilên reş, lê rengê Sûriyê îslama tundrew qebûl nake û got, “Di roja îro de û li gorî rewşa Sûriyê ya niha, girînge ku jinên Sûriyê yekgirtina xwe ava bikin.”

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Bi avakirina desthilatdarî û dewletan re, jin hate kolekirin, bi taybet jinên kurd û Sûriyê bi salan di bin koletiya Rejîma Baas de jiyan kirin. Lê piştî şoreşa 19’ê Tîrmehê û ragihandina sîstema Rêveberiya Xweser û projeya Netewa Demokratîk, jin li hemberî hemû siyasetên ku li dijî wê dihatin meşandin têkoşîn kir û di hemû warên jiyanê de pêşketineke ber bi çav pêkanî. Niha jî Sûriyê ji desthilatdariya Baas rizgar bû û hikumeteke nû tê avakirin, lê jin wê çawa di nava vê hikumetê de cih bigere an jî wê bi çi rengî jiyan bike ne diyare, lewra hewldanên jinên Sûriyê ji bû hevgirtinekê heye. Derbarê girîngiya hebûna rola jin di nav Sûriya nû de, endama Rêveber a Meclisa Jinên Sûrî Erîfa Bekir ji rojnameya me re axivî.

Erîfa Bekir diyar kir ku ew nêzîkatiyên hikumeta Şamê ya demkî yên bi jinê re dişopînin û wiha got: “Ji destpêka hatina hikumeta Şamê ya demkî ve em nêzîkatiyên wan di derbarê jinê de dişopînin. Lê li gorî şopandina me, nêzîkatî hikumeta dimkî ne li gorî rewşa Sûriyê û pêkhateyên wê ne. Ji ber ku gelê Sûriyê gelekî zanistî ye, gelek pêkhate lê jiyan dikin û mezebên cûda lê hene. Girînge ku nêzîkatiyên hikumeta Şamê ya demkî li gorî fiseyîfosaya Sûriyê û pêkhateyên Sûriyê wê bin. Herwiha li gorî şopandina me û tiştên ku em dibhîzin cilên girtî li jinê belav dikin, bi vê yekê dixwazin jinê vegerînin bin perdeya cilên reş, lê jina Sûriyê jî di bin vê peredeyê de nikarî bijî û vê yekê qekbûl nake û red dike. Ya din jî hikumeta Siwêsra biryarek derxist ku yên cilên girtî li xwe bikin wê cezayên diravan li wan bê birîn, ew jî li gorî zagonên Siwêsrî ceza wê bide jinên ku cilên girtî li xwe bike, roja din ji vê biryarê li Banyasê bi dehan jinan cilên reş li xwe kirin, ev tiştekî sîstemlî ye ku dibêje Siwêsre ev biryar derxist, em jî li dijî vê birayrê ne. Dixwazin Sûriyê bikin Afxanistan wekî ku Talîban çawa li jinên Afxanê dikir li jinên Sûrî jî bike, hikumeta Afxanî dixwaze vê sîstema Afxanê li Sûriyê bidin meşandin. Li Kêlek vê jî her kesî dît dema ku Wezîra Derve ya Alamaniya hate Sûriyê, Ehmed Elşeri bi dest silav neda wê, ev dide diyarkirin ku hikumeta nû li gorî şeriyeta îslamiyetiyê dimeşe. Lê rengê Sûriyê îslama tindrew qebûl nake.”

**‘Pêwîste jin bi destê xwe mafê xwe binivîse’**

Erîfa Bekir di berdewamiya axaftina xwe de anî ziman ku amadekarî ji bo damezrandina hikumeteke nû a Sûriyê tê kirin û pêwîste di vê hikumetê de mafê jin parastî be û wiha got: “Niha hazirtî ji bo damezarandina hikumetekî nû ji Sûriyê re tê kirin, wê di vê hikumeta nû de destûrek were nivîsandin, destûrekî Sûrî, pêwîste mafê jin vî destûrî de hebe û li ser bingeha wekheviyê be. Jin di şoreşa Rojava de gelek berdêl dan, kedekî mezin kir û gelek destkeftî bidest xistin, lewra pêwîste mafê jinan di destûra Sûriyê jî hebe û jin bi destê xwe destûr binvîse. Heger ku mêr destûr ji bo mafê jinê binivîsîne, nikare mafê jin bidê, ji bo vê yekê xwesteka me ew e ku jin bi xwe mafê xwe binvisîne. Hêviyên me hene ji hikumeta nû, an jî Komîteya Destûrî yên ku destûrê Sûriyê binivîsîne, girînge wekhevî hebe di civakê de, ji ber ku heger mafê jin di civakê de tunebe, wê ew civaka bi aliyekî tenê be.”

**‘Girînge deng û helwesta jinê yek be’**

Erîfa Bekir anî ziman ku Meclisa Jinên Sûriyê ji sala 2017’an ve û heya niha ji bo mafê jinên Sûriyê têdikoşe û wiha got: “Em weke Meclisa Jinên Sûrî di sala 2017’an de, me dest bi têkoşînê kiriye, wek rêxistinkirina jin. Herwiha têkiliyê me bi jinên hemû pêkhateya re di hundir Rojava de û derveyî Rojava de heye. Di heman demê de nûnerên me li Tevahî Sûriyê hene û danasîna Meclisa Jin ji gelek jinan re hate kirin. Di dema dewletê de gelek zordarî li ser jinê hate kirin, destirêjî lê hat kirin, mafê wê tune bû, di her qadê de nikarî mafê xwe bigirta, dibe ku roleke didan jinê, lê rolekî teşeyî bû, ew jî ayîdê mêr



bû, yan bi navê mêran kar dikir, ne weke bi nasnama jin û îradeya jinê kar dikir. Ji ber wê bangewaziya me ji tevahî jinan re di hundir û derveyî Sûriyê de, destûra nû tê nivîsandin ji bû Sûriyek nû, lewra pêwîste di vê destûrê de mafê hemû jinan û yekîtiya wan hebe. Herwiha girînge ku deng û helwesta jinên Sûriyê yek be.”

**‘Yekgirtin û wekheviya jinên Sûrî pêwîst e’**

Erîfa Bekir axaftina xwe wiha qedand: “Di roja îro de û li gorî rewşa Sûriyê pêwîste ku hemû jinên Sûrî yekgirtin û wekheviya xwe ava bikin. Êşa jin yeke, yê ku di şoreşê de êş kişandiye jin in, yê ku zarok winda kirine jin in, malên wan wêran bûn, tundiya li ser jin tê meşandin, ne tenê tundî li ser jina kurd tê meşandin, di heman demê de li ser jina ereb, aşûr, ermen û tevahî jinan tê meşandin, ji bo wê pewîste em li hemberî hemû şert û mercan yekîtiya xwe ava bikin û jin êdî nema bikeve bin desthilatdariya tu kesî.”

## Ji Pênûsa Jin

### Jinan li Sûriyê dest bi pêvajoyeke nû kirin

Nehîr Pale

Li Sûriyê jin berî salên notî û dawiya salên heştî li ser asta gelek bajarên Sûriyê xwe birêxistin kirin. Keçên Kurd ji bo doza gelê Kurd were çareser kirin tevlî Tevgera Azadiyê ya Gelê Kurd bûn. Her wiha dema ku sîstema cebhewiyan ango milîsan hat avakirin bi taybet dayîkên Kurd berpirsyartiya doza tevgera azadiyê rakirin û dest bi xebatê kirin. Jinên milîs gel birêxistin dikirin, xebatên perwerdê birêve dibirin, Rêber APO bi gelê Kurd didan naskirin, mal bi mal digeriyan alîkarî kom dikirin û pêşengiya çalakiyan dikirin. Jinên ku bûn milîs û şervan bingehê Tevger û rêxistinên jin ên Sûriyê dan avakirin.

Bi şoreşa Rojava re xebatên jin ên rêxistinî ji gelek aliyan ve berfereh bûn, ji aliyê leşkerî, siyasî, aborî, civakî, tendiruştî, perwerde, ragihandin û çandî ve xwe birêxistin kir. Dest bi lêkolînan kir da ku jineolojî pêşbixînin û çareseriyê ji pirsgirêkên civakî re bibîn in.

Li giştî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dest bi têkoşîneke siyasî û civakî kirin. Bi vê têkoşînê re ji bo hebûna jinê gelek bedelên mezin hatin dayîn.

Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ciyê yekemîne ku jin bê astengî dikarîbû xwe lê birêxistin bike. Pirsgirêka zayendperestiyê yek ji pirsgirêkên civakî ya sereke tê dîtin. Jin ji hemû pêkhateyan tevlî tevger, meclis, sazî û komîteyên jin bûn. Bi tevlîbûna xebatê re kesayeta wan xurt bû, êdî di têkoşîna xwe ya li hemberî zayendperestiyê gihîştin asta hemû rê û rêbazên li hemberî jinê têne bikar anîn werin lêpirsîn kirin û bibin xwedî helwest. Ji vê yekê re şoreş tê gotin.

Têkoşîna jina Sûriyê li hemberî sîstema Baas a Sûriyê pêvajoya yekemîn bû, bi şoreşa Rojava re û li hemberî çeteyên DAIŞ û gurûpên çeteyan li ber xwe dayîn pêvajoya duyemîn bû, niha jî pêvajoya siyemîn destpê kir. Di vê pêvajoyê de wê li hemberî sîstema dewletî ya mêr têbikoşe. Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jin xwedî tecrûbeyeke mezin e. Bê mêr xwe birêxistin dikin û birêve dibe. Di şert û mercên niha Sûriyê ketiyê bûyîna xwedî îrade, xwe dayîna îfade kirin û hebûna xwe diyar kirin ji bo tevayî jinên cîhanê tecrûbeyekî mezin e.

Ne tenê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê êrîşî jinê dikin, kîjan hêz dikeve Sûriyê destpêke berê xwe dide jinê û hebûna wê inkar dike. Sîstemên zîhniyeta mêr diparêzin hebûna jinê ji bo xwe xeter dibînin. Niha di bin navê ol û kevneperestiyên civakî de destpêkirina zextê li jina Sûrî dikin. Ya jina Sûrî wê di malê de bi riya zewacê bifetisînin û dawî li şoreşa wê bînin, an jî yê wê bînin rewşa ku ji Sûriyê koçber bibe. Daxwaza jin a azadiyê û sîstemeke demokratîk li ser sîstema wan xeter e.

Di pêvajoya siyemîn de ji bo jin bikaribe deskeftiyên xwe biparêze û di destûra Sûrî de cî ji jinê re were dayîn, têxwestin ji aliyê siyasî û leşkerî ve li eniyên pêş be. Li hemberî êrîşan hîn zêdetir xwe birêxistin bike, şûna ku mêr çarenûsa wê diyar bike, ew bi xwe çarenûsa xwe diyar bike.

# ‘Bi ruhê Şerê Gelê Şoreşgerî em ê parastina axa xwe bikin’

**Dîlan Mulhim/ Qamişlo**

**Dayîkên bajarê Qamişlo diyar kirin ku ew ê heta dawiyê parastina axa xwe bikin û wiha gotin: “Pêwîste her kes bi ruhê Şerê Gelê Şorşgerî dakevin meyidanê û parastina axa xwe bikin.”**

Piştî ketina rêjîma Baas û kontirolkirina beşekî mezin ji axa Sûriyê ji aliyê HTŞ’ ê ve gelek guhertin li herêmê çêbûn. Di dema niha de herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê di rewşeke awarte de derbas dibe û gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê xweparastinê wekî erkeî xwe yê sereke dibînin. Di vê çarçoveyê de welatiyên bajarê Qamişlo li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî parastina tax, bajar û gundên xwe dikin.

Derbarê girîngiya parastina jinan ji taxên xwe re, dayikên bajarê Qamişlo yên bi navê Fadiya Xelef û Cîhan Mûsa ji Rojnameya me re axivîn.

Dayika bi navê Fadiya Xelef da zanîn ku di vê dema niha de ku kompilo li ser kurdan heye ji bo mafê gelê kurd tune bikin, pêwistî bi xweparastinê



Fadiya Xelef

heye û wiha got: “Di vê demê de ji her kesî tê xwestin ku bi rihê şerê gelê şoreşgerî parastina herêma xwe bikin û bi şev roj têkoşînê bikin. Herwiha em ê rajin çek û bi hêza xwe QSD‘ ê re û li hemberî dijmin şer bikin û piştgiriya zarokên xwe bikin. Me sozek bi welat û şehîdê xwe re daniye û heta bihêndana dawî em ê li hemberî dewleta Tirk û çeteyê wê berxwedaniyê û têkoşînê bikin. Em ê bi hebûna xwe Erdogan û çeteyên wî têk bibin. Ev ne care yekeme ku Erdogan û çeteyên wî tên şikandin, Erdogan bi van êrişên xwe nikare vîna gelê kurd têk bibe, ji ber ku gelê kurd xwedî hêze.”

Fadiya Xelef anî ziman ku armanca dewleta Tirk ew e ku bi van êrişên xwe vîna gelê kurd bişkîne û wiha got:



Cîhan Mûsa

“Dema ku zarokên me şehîd dikevin bêhtir morala me xurt dibe û dewleta Tirk nikare bi van êrişên belafirên bê mirov tirsê bixe dilê me. Em ê bi hemû hêza xwe li hemberî dagirkeriyê bisekin û şerbikin. Axa Rojavayê Kurdistanê bi hezaran şehîd dane û em ê jî heta dawiyê berxwedaniyê bikin. Em ê li pişta hêza xwe bisekinin û parastina axa xwe bikin. Herwiha ji her kesî tê xwestin ku parastina axa xwe bike û bi taybet dayîk ji ber ku dayîk parastina mal û zarokê xwe dike, pêwîste parastina welatê xwe jî bike. Banga min ew e ku her dayîkek parastina axa xwe bike û bibe bersivek ji bo dijmin.”

Dayika bi navê Cîhan Mûsa jî eşkere kir ku ew her şev derdikevin li nava taxa xwe ji bo ku parastina taxa xwe bikin û wiha domanid: “Di dema niha de parastin girînge ji ber ku rewşa herêmê ne arame û pêwîste ku her kes parastina axa bike. Herwiha parastin ji her tiştî girîngtire û ji bo ku em xwe ji dijmin biparêzin, pêwîste em têkoşînê bikin û piştgiriya şervanên xwe yên ku di çeperên şer de berxwedaniyeke bêhempa didin meşandin, bikin. Rewşa herêmê ya niha nebaş û xeterî li ser heye, ji ber vê yekê xweparastin erkê her kesî ye ne tenê yê şervanan e.”

Cîhan Mûsa destnîşan kir ku pêwîste her kes tevlî Hêza Parastina Civakî bibe û parsatina axa xwe bikin û wiha qedand: “Pêwîste her kes raje çek û parastina herêma xwe bike. Banga min ji keç û xortên me re heye ku tevlî Hêza Parastina Civakê bibin. Erdogan dibêjê ez ê we û çekê we binerd bikim, lê ne ew û ne bavî wî nikare me binerd bike û heta dawiyê em ê piştgirya hêza xwe QSD‘ ê bikin û li hemberî êrişan berxwedaniyê bikin. Di heman demê de heta dilopa xwînê di laşê me de hebe em ê parastina axa xwe bikin.”



# ‘Çand û Hunera Şoreşgerî bi Tevgera Azadiyê re dest pê kir’

Lêkolînerê hunerê Serhed Zana diyar kir ku çand û huner di cewherê xwe de şoreşgeriye, lê sîstemên desthilatdar ew veguhertine bazirganiyê û got, “Temenê Çand û Hunera Şoreşgerî bi Tevgera Azadiyê re hatiye destpêkirin. Di vî temenî de bi hezaran berhem û bi 100’an berdêlên giranbuha hatin dayîn.”

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê girîngiya çand û hungera şoreşgerî, lêkolînerê Hunerê Serhed Zana bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Di cewherê xwe de çand û huner ji bo civakê tê çi wateyê?**

Dema tê gotin çand, em behsa mirov dikin, tiştê ku mirov bi destê xwe çêkiriye û pê jiyana xwe didomîne. Mirov bi destê xwe tiştan diafirîne û teşeyeke bi wate dide wê, dibe ku berhemên madî yan jî manewî bin, ji vê re dikarin bibêjin çand. Çand di kurdî de ji çandiniyê tê. Alavên madî û manewî ji malekê heyanî erebeyekê, ji teknîk heyanî alavên cotkariyê, ji ol hetanî exlaq, ji huner heyanî hizir, ev hemû berhemên mirovin, sîwana van re çand tê gotin. Di heman demê de tiştê ku em jêre dibêjin kevneşopî û mejo bi gotinekî din dîrok, sîwana wan çand e.

Huner jî beşekî di nava çandê de ye. Dîroka çandê hem dîroka hunerê muhtemele bi hev re ye. Dema mirov dest bi avakirina çandê kir, pêre jî berhemên hunerî dest pê kir. Huner beşeke çandê herî xurte. Çanda ku civak pê jiyan dike, huner dikare pêşengiya wê bike, sererast, xweşik û hurguliyên wê baştir pênase bike. Huner ji gelek beşan pêk tê, mîna beşê govend ê ku ji kurdan re beşê herî sereke ye, herwiha muzîk jî, ev sedemên xwe sisyolojîk hene. Sîname dibe ku nû dikeve jiyan kurdan, şano ew jî dîroka wê ne kême, di dîrokê de dikarin bibêjin heye, wêne jî, ji serdema şikeftan û heya niha, dibe ku di roja me ya îro de pir ne berbiçave, lê ev beş hemû di çanda kurdan de, an jî de Kurdistanê de dewlemende.

Dema em dibêjin Kurdistan tenê behsa kurdan nakin, ji ber reng, ziman, netew û baweriyên cûda di axa Kurdistanê û Rojhilata Navîn de, jiyan kirine, hem jî, ji hev bandor bûne, di encamê de hunerkî pir dewlemend ku ji gelek aliyan ve têrker û pêşengiya civakê bike derketiye holê, lê pêşengên wê yên sereke ku ev huner belavî Rojhilata Navîn kiriye kurd in. Dema em vê dibêjin em kurdan pir pîroz nakin, lê em behsa rastiya dendika civakê dikin, huner jî dikarin wiha pênase bikin. Di heman demê de huner tê wateya pênaseya sosyolojiya civakî, xeyal û daxwazên civakê, guhertin û veguhertina civakê. Ji bo ku huner



bibe huner, jêre armanc, çîrok û naverok pêwîste. Huner jî mîna çand ayidê mirov e. Heger em ji teşetekî re bêjin huner divê em behsa mirov bikin, mîna têkiliya mirov bi xweza, civak, gerdûn û jiyan, bêyî van nikarin hunerê pênase bikin.

**-Kengî çand û huner dibe çand û hunera şoreşgerî?**

Dema em behsa çand û hunera şoreşgerî dikin, tê wateya guhertin û veguhertina radîkal. Çand an huner di cewherê xwe de tiştekî şoreşgerî ye. Çand hêdî hêdî tê guhertin, huner yek ji yê ku çandê diguherîne û tiştên cûda lê bar dike, hem jî tiştên ku nema bikêr civakê tê ji derdixe. Di roja me ya îro de, heger em behsa Kurdistanê dikin, em behsa komkujiyan dikin, ji ber dîroka Kurdistanê bi komkujiyan dagirtiye, li erdnîgariya Kurdistanê buhista ku xwîn têde nehatiye rijandin, nemaye. Talan, tecawiz, dagirkerî û mîtîngerî her tim li ser Kurdistanê bi hezar salan heye, bi taybet zilamsalarî xerabiyên pir mezin li ser Kurdistanê pêk anîne. Pîvan û exlaqê civakê ji cewherê xwe hatiye derxistin, ew jî bi talakirina erdinîgariya Kurdistanê re.

Pîvan, exlaq, xeyal, fikir û azadiya civakê bi erdingariya wê re hatiye talankirin, ji ber wê jî çand û hunera şoreşgerî di vir de deha herkbar, bi hêz û xwe bawer derdikeve holê, civakê hişyar, perwerde û ronahî dike, hem jî di parastinê de pêşengiya civakê dike. Civak tenê bi leşkerî, hizir û siyasete nayê parastin, lê ev hemû cûreyên parastinê ne, em a yê ku rola mezin bilîze huner e. Huner di parastinê de rola sereke dilîze, ji ber ku dikare zû xwe bighîne dil û mejiyê civakê û bandorê li ser bike. Heta niha dagirker û kapîtalîst wekî çekekî ji hevxistin û xerakirinê, huner hinekî ji çerxa kapîtalîzmê niha di cîhanê de digerîne, lewra li hemberî hunera kampîtalîzmê û bazariyetê, divê huner asta xwe bilind bike. Dema ku huner asta xwe bilind dike ji bo parastinê, êdî dikeve rewşekî cûda û dibe hunerekî şoreşger. Çand û



hunera şoreşgerî ew e ku hem welat, civak û exlaqê xwe diparêze, zindî dike, guhertin û veguhertinan çêdike, ronahî û pêşengiyê dike.

**-Rola hunermendan ji bo welat çi ye û çiqasî hunermend dikarin bandorê li civakê bikin?**

Nirxandineke Rêber Apo heye ku tê de dibêje “Hunermendên me ew in ku hewce bû agirê azadiyê pêxin û gava gerek kir jî, di wî agirê azadiyê de bişewitin” hunermend rola wî ew e. Di Rojhilata Navîn de tevgerên wisa derketine pêş ku hunermend, fîlozof û wêjevan her tim pêşengî kirine û berdêl jî dane. Weke Tevgera Azadiyê jî, ji sale 82 û 83’an ve bi pêşengiya Rêber Apo komên Rojava hatin avakirin, herwiha yên ku niha em ji wan re dibêjin xeta TEV-ÇAND’ê bi pêşengiya şehîd Mizgîn, şehîd Sefqan, 83 koma Berxwedan li Ewropa pêş ket, 91 li Istembol (NÇM) Navenda Çanda Mezopotamiya, piştre Mêrsînê, Edena û 2001’an jî li Amedê Navenda Çanda Mezopotamyayê hate vekirin. Piştî Şoreşa Rojava û şûn ve, ev qonax berfireh bû, ekademî û navendên çandê vebûn, êdî Çand û Hunera Şoreşger bêtir pêş ket.

**-Çand û hunera şoreşgerî kengî bêtir xwe daye pêş û temenê wê çiqas e?**

Temenê Çand û Hunera Şoreşgerî bi Tevgera Azadiya Kurdistanê re dest pê kir. Di vî temenî de bi hezaran berhem û bi 100’an berdêlên giranbuha hatin dayîn, da ku çanda xwe biparêzin û qedaxa li ser zimanê xwe rakin, mînaka vê li cîhanê tune ye. Li deverên din dikarin bêjin ji bo çand û hunera xwe, hunermend ewqas şehîd bikevin û fedekariyê bikin, dibe ku hin berdêl dabin, lê bi qasî Kurdistaniyan ewqas berdêl nehatiye dayîn. Dibe ku gelek kêmasî hebin lê bi fedekariyeke pir mezin çand û hunera şoreşgerî heta roja me ya îro hatiye parastin. Em şehîdên xwe yên ku di orixa heqîqetê de şehîd bûne, bibîr tînin û bejan xwe li hemberî wan ditewînin, rê û xeyalên wan berdewam dikin.

**-Teybetmendiyên hunermend çi ye, bi taybet hunermendên Kurdistanê?**

Ger em behsa teybetmendiyên hunermend bikin û di Kurdistanê de jiyan dikin, bi taybet em di nava Şoreşa Rojava de ne, divê cûda bigirin dest. Hunermendekî derveyî Kurdistanê dibe ku derdê wî ne azadî, welat, parastin û komkujî be, lê ji bo Kurdistanê pêvajoyên ku Kurdistan tê re derbas bûn, helbet hunermendên di vî welatî de jiyan dikin û bi komkujiyan re rû bi rû tê, li dijî wê têkoşîn erkê wî sereke ye. Dibe ku derfetên me kêm bin jî, lê çîrokên ku di vê têkoşînê de, bi hezaran qehremanan derketine pêş, her qehremanek serpêhatiyên wî yên cûda heye, hemû dibin destan. Li hin welatên cîhanê, çîrokên wan ên qehremantiyê tune ne, çîrokên wan li ser desthilatdariyê ye, îro jî Rojava û Rojhilatê Navîn dibe qurbanê vê yekê.

kesên ji Kurdistanê di nava dagirkerî û mîtîngeriyê tên dinyayê, dibînin ku çawa xweşik, bira, dê û bav ji mirovên rêzê dibe qehreman û vî welatî diparêzin, heger hunermend vê yekê nebîne, wê behsa çi bike, heger buhistek axa te azad tunebe çiqas dikarî behsa tiştên cûda bike, lewra rast destgirtin girîng e. Armancê hunerê derxistina derdê civakê û rastiya welat. Hunera ku nebe malê civakê, wê guhdarkirina wê demkî be. Her tim ez vê dibêjim heta di serê hunermendên Kurdistanê de, Kurdistaneke azad ava nebe, Kurdistan ava nabe, heger azad jî bû, wê Kurdistanekî zuha be, ji ber avakirina xeyalên Kurdistaneke azad ayidê hunermende. Di Rojava de gelek romanên ku hîn nehatine nîvisandin, an jî stran û şanoyên ku hîn nehatine çêkirin, ji ber wê jî divê hunermend xwe berpirsyar vê bibîne. Em di rojên dîrokî re derbas dibin, ji bo van rojên dîrokî re mirov, pêşeng û hunermendên dîrokî pêwîstin.

Hunermend mirovên bi wijdanin, mirovên bê wijdan nikarin hunerê bikin. Modêla ku niha li Rojava Bakur û Rojhilatê Sûriyê de tê çêkirin, dikare bibe modêla Sûrî giştî û cîhanê, ev yek hatiye isbatkirin, ruxmê ku rojekî li Rojava şer nehatiye rawestandin, mirov jê model girt, ji bo wê helbet dikare bibe modêla Sûriyê, Rojhilata Navîn û Cîhanê, lê yê ku vê modêlê bi cîhanê bide naskirin, parastina wî bike û serferberî ragihîne, hunermendin. Rêber Apo got “Ez dixwazim bibim dengek ku were bihîstin û min wêneyek çê kir, dixwazim were dîtin” ê ku bihêle dengê Rêber Apo bê bihîstin wê hunermend bin. Di şexsê hunermendan de proja Rêber Apo bê dîtin, eger her mirovek bibe deng, reng, çav û xeyalên Rêbertî wê rojên azad û xweştir li pêş me bin. Em bi hezar salan bi hêviya vê azadiyê ne, lewra bi hezar salan têkoşîna wê dikin, cara yekê ye ewqas sîstemekî piralî derdikeve û dibe modêlekî ji bo Rojhilata Navîn ne.

# Şehadeta Xebat Dêrik bû nexşeriya Şoreşa Rojavayê Kurdistanê

Birayê Şehîd Xebat Dêrik, Hisên Mihemed Remedan da diyarkirin ku şehadeta Xebat Dêrik hîma şoreşgeriyê di civakê de ava kiribû û wiha got: "Xebat Dêrik ne tenê birayê me bû, di heman demê de mamoste û fermandarê jiyana me jî bû."

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

Di ser şehadeta Şehîd Xebat Dêrik 13 sal derbas bûn. Xebat Dêrik, yek ji pêşengên têkoşînê ku hîmên avakirina şoreşa Rojava danî, di nava damezrînerên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) de cîh girt. Di 7'ê Çileya 2012'an de damizrênerê YPG`ê Xebat Dêrik ku bi guleya ixanetê li bajarê Qamişlo birîndar bibû, tevî hemû mudaxeleyan bijîşkî jî, di 14 Çilya 2012'an de li nexweşxaneyeke bajarê Helebê tevlî karwanên şehîdên doza azadiyê bû.

Derbarê jiyan û bandora şahadeta fermandar û şoreşgerê mezin Xebat Dêrik (Mehmûd Remedan Mihemed) de, birayê wî Hisên Mihemed Remedan ji rojnameya me re axivî.



**'Şehîd Xebat Dêrik, zarokekî jîr bû û dihat hezkirin'**

Hisen Mihemed da diyarkirin ku Şehîd Xebat di jiyana xwe ya li malê de, pîvanên şoreşgeriyê dabû avakirin û wisa dest bi axaftina xwe kir: "Xebat Dêrîk bi navê malê Mehmûd Remedan Mihemed li gundê Kasanê jidayik bû. Gundê me navbera sînorên Bakurê Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê hemberî çiyayê Cudî cih digire. Em malbatekî welatparêzin û bi nirxên Kurdistanê ve girêdayî ne. Xebat birayê min yê ji min mezintir bû. Em ji malbatekî 4 ferdan pêk tê, Şehîd Xebat birayê 3'emîn bû. Zarokekî jîr bû. Ji bona rewşa malbatê ya aborî ne baş bû, piştî dibistana seretayî berê xwe dan bajarên Sûriyê paytexta Şamê. Li ser derdor û civaka gund bandoriyeke mezin avakir. Piştî temenê xwe yê 15 salî ji gund derket êdî ne hate gund. Di nava gund de, rûxmê ku demek dirêj jî nema dihate hezkirin û civakî bû. Tekiliyên xwe yê bi gel min jî pir politik û di asta fêrkirina jiyanî bû. Di sala 1980'an de leşkeriya neçarî ya wê demê hikûmeta Baas'ê kir. Bi nêzî 5 salan leşkeriya neçarî kir û dîsa vergeriya Kurdistanê. Demê leşkerî di Lûbnanê dikir, Tevgera Azadiya Kurdistanê naskir û bi nêz ve pê re mijûl bû. Piştî naskirina tevgerê demekê peywendiyên wî li gel me qût bû. Dema vê carê vergera Şamê de, hem xebatê di aliyê aborî de dikir û di heman demê de xebatên Tevgera Azadiyê dimeşand. Wê demê peywendiyên xwe li gel heval Selîm û Hemze de danî bû. Di sala 1986'an de ez ji bo karekê çûm Şamê min dît û xatir ji min xwest û tevlî Tevgera Azadiya Kurdistanê bû."

**'Tevlîbûna wî di nava refên Gerîla de şanazî û serbilindî di nava malbatê de ava kir'**

Hisên bi bîr xist ku şehîd Xeba bi avêtina pêngavê di nava Tevgera Azadiyê ji bona Rojavayê Kurdistanê jî serkeftinek bêhempa bû û bi wisa axaftina xwe domand: "Di sala 1986'an de li Lûbnanê tevlî nava Tevgera Azadiyê bû. Bavê min ev mijar baş fêmkiribû. Ji ber ku bavê min welatparêz bû û rewşa Kurdistanê wê demê nêz ve dişopand. Dema ku şehîd xebat tevlî bû, axaftinek kir go hajê te diyamin û bavê min hebe. Her tim digot zarokên min yên ku tevlî tevgerê bibin rêya wan vekirê ye. Di meha Pûşbera 1986'an li akademiya Mahsûm Korkmaz tevlî perwerdeya leşkerî bû. Piştî perwerdê, derbasî çiyayên azad bû. Wê demê li ser zimanê herkesî, navê wî hebû. Bakurê Kurdistanê û heya Rojavayê Kurdistanê gel wî nasdikir. Di destpêka şoreşa Rojavayê Kurdistanê de komên destpêkê yên ji bo parastina deskeftiyên Kurdistanê derbas bû, hevalê Xebat û rêhevalên wî bûn. Şehîd Xebat Dêrîk bi damezirandina YPG'ê diyariyek ji bona Rojavayê Kurdistanê hişt. Di sala 2012'an de komên ku çiyayê azad di bi fermandariya Xebat Dêrik derbas bû, destana qehramantiyê li Rojava nivîsandin. Piştî damezirandina YXG (Yêkinîyên Xweparastina Gel ) damezirand. Gelek xizm û endamên malbata me ya teng tevlî şoreşa Kurdistanê bûn û şehîd ketin. Şehîd Xebat bandora xwe li ser hemû civakê dabû avakirin. Niha li ser wê hîmê keç û xortên ku bi mîrateya şehîd Xebat girtin ala wî dihejînin. Ev cîhê serbilindî û şanaziyê ye ku em xwedî bira û şoreşgerek wek Xebat Dêrikin. Şehîd Xebat xwe bi fikir û ramanên Rêber Apo xemilandi bû. Rojekê dema nû derbas Rojavayê Kurdistanê dibe, dema ku Çiyayê Spî yên di navbera sînorên Başûr û Rojavayê Kurdistanê de dimîne, dema derbasî wî ali dibe cilê xwe dide rêhevalên xwe yên din. Dîbîne cil berda nînin û bavê Şehîd Rêber dibêje 'ji ber wî hîmê xwe li ser fedekariyê ava kir, ti caran ev şoreş têk naçe.' Wi bû gelek keç û xortên wê hîmê xwe perwerde kirin û gehiştine asta şahadetê. Dîsa şahadeta Xebat Dêrîk di destê xiyanetkarê bi navê Ebdilah Bedro hatkirin. Ev endamê MÎT'ê û ENKS'ê hevkar hatibû hilbijartin. Kurê wî yê bi nasnav Sadiq jî din ava refên azadiyê qut bibû. Destê wan dinav xwîna sedan şoreşgerên azadiyê hene Lê rêhevalên Xebat Dêrik bi bilindkirina xebatê şoreşê tola Xebat Dêrik erdê nehiştin. Şehîd Xebat sala 2012'an li di nexweşxaneyeke bajarê Helebê, tevî hemû hewildanên bijîşkî jî tevlî kerwanên şehîdan bû."



**'Wî mirateyek mezin ji bona malbat û nifşên Rojavayê Kurdistanê hişt'**

Remedan bi mebesta salvegera şahadeta fermandarê mezin Xebat Dêrîk, şehîdên şoreşa Kurdistanê bibîranî û wiha axaftina xwe qedand: "Gelek şoreşger û pakrewan li ser vê axa pîroz ked dan û şehîd bûn. Ev bû mînaka pêşxistina dozê. Em deyndarê wan pakrewanên doza Kurdistanê ne. Raste her şehîd û qehremanek cihê wî di dilê me de cûda ye, lê şehîd Xebat bi şahadete xwe û jiyana xwe êşek mezin di dilê herkesî de hişt. Ev bû nexşerêya azadiya Kurdistanê. Hemû civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe bi mîrateya Xebat Derîk rexistin dike. Çawa wek hatina wî ya Rojavayê Kurdistanê gelek endamên malbatê tevlî azadiyê bûn û di heman demê de, bandora şahadeta şehîd Xebat pir li ser malbatê ava bû. Gelek şoreşger di nava malbatê de, piştî şahadeta şehîd Xebat ava bûn. Em dîsa li Xebat Dêrik û şehîdên şoreşa Kurdistanê hemûyan bibîrtînin û soza şopandina rêya wan dikin."

# Pergala perwerdeya Başûr di xizmeta dewleta Tirk de ye

**Navenda Nûçeyan**

**Bi destûra Wezareta Perwerdeyê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê bernameya xwendinê ji qonaxa parastina zimanê dayikê gihîştiye qonaxa dagirkirina ziman, ji fêrbûna navên Kurdî yên wek "Dara û Zara û Zirîze" ve gihîştiye "Yagmûr, Denîz û Yildirim".**

Dewleta Tirk a ku sed sal in asîmîlasyona herî dermirovî li ser gelên Bakurê Kurdistanê dimeşîne, niha bi destê hikûmeta Herêma Kurdistanê asîmîlasyonê li ser gelên Başûrê Kuridstanê dimeşîne. Niha Başûrê Kurdistanê di qonaxa dagirkirinê de ye û hikûmeta Herêma Kurdistanê carna bi zanebûn an jî bê zanebûn bi xwe alîkariya vê dagirkirinê dike. Li Başûrê Kurdistanê, di proseya perwerde û fêrkirinê de, hişyariya takekes bingeh nehatin girtin, gelek peyvên biyanî û xerîb bi zimanê dayikê re di çîrokên pirtûkan de hatin tevlihevkirin ku di nav civaka Kurd de ev nav tune ne û ji navên Kurdî re xerîbin.

Di pirtûka Perwerdeya Îslamî ya pola duyemîn ya dibistana navîn ya çapa sala 2023'yan de ku niha di dibistanan de tê bikaranîn ku ji aliyê neh mamostayan ve hatiye amadekirin, hinek navên Tirkî wek "Yagmûr, Yildirim, Denîz" hatine bikaranîn ku ji civak û zimanê Kurdî re xerîbin. Ev bikaranîna navên Tirkî di şûna navên Kurdî de, dikare nakokî û pirsiyaran ji bo zarok û malbatên wan çêbike û metirsiyeke mezine li ser nasnameya zimanî ya zarokan.

Di vê pirtûka ku xwendevanên pola duyem hînî her tiştî dibin, ji bo




karakterên çîrokan navên tirkî yên wek "Yagmûr, Yildirim, Denîz" hatine bikaranîn. Ev nav ji aliyê nijadperestên Tirk ve tên bikaranîn û li şûna wan dikarin navên Kurdî yên resen bihatana bikaranîn. Ev yek nîşana dagirkirina zimanî ye ku diviyabû pêk nehatiba.

Pisporê Zimanê Kurdî Rizgar Xidir vê yekê wek metirsiyekê li ser zimanê Kurdî dibîne û got; "Ev nav ji çand û civaka Kurdî re biyanî ne û bang li Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Wezareta Perwerdeyê ya Herêma Kurdistanê dike ku di dema danîna bernameyên xwendinê de bi hûrgulî di ber çavan re derbaz bike, da ku ziman û çanda me neyê xirabkirin. Ji ber ku em tenê bi saya zimanê Kurdî, peyv û navên Kurdî heta roja îroyîn weke netew mane."

Dagirkirina ziman û çandê bi sed salane ku dewletên dagirker li rex dagirkirina leşkerî û erdnîgarî bi ar tînin da ku gelê Kurd bihelînin. Kurdan bi sed û bi hezaran caran canê xwe dane da ku ziman û çanda me bijîn. Lê îro rayedarên Herêma Kurdistanê bi xwe planên dagirkeran bicih tînin, ku metirsiyeke mezine li ser ziman û nifşên me yên niha û pêşerojê. Lewra divê gavên cidî ji bo rawestandina vê dagirkirina zimanî û bikaranîna peyvên biyanî bên avêtin.



# QSD'ê bi gurzê Rustemê Zal li Tişrînê şerekî efsûnî dike

Li dijî planên dagirkeriyê şervanên QSD'ê li Bendava Tişrînê bûne Kawayê Hesinkar û Rustemê Zal ên serdemî. Bi coşekê xurt ev şerê rewa ji bo parastina gelan tê kirin û gel jî li bendava Tişrînê bûne şahidê vê berxwedaniyê.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Ev meheke ku dagirkeriya Tirk, çeteyên Hemzat û Emşat bi firokên şer, tang, top hem jî dironan êrişî Bendava Tişrînê dikin. Di çarçoveya şerê rewa de jî Hêzên QSD'ê bi ruhê tolhildana Şehîd Harûn û hemû cangoriyên azadiyê êrişî deverên gundewarên Minbic û Bendava Tişrînê dikin. Hêjayî gotinê ye ku şervanên QSD'ê bi teknîkeke şer a pêşketî û coşeke bilind berxwedaniykeke bêhempa didin meşandin. Nexasim êrişên hewayî yên Yekîneyên Şehîd Harûn ku bi dironên Birûsk ku tirs xistiye nava dilê komên çete. Birûsk bûye mîna birûskên buharan, lewma jî Birûskên Harûnan qira konên çete û amûrên wan ên leşkerî aniye. Ji ber vê yekê jî piraniya van komên çete di bin neçariyê de ji bo qezenckirina pereyan û tirsa kuştinê li ser destê dewleta Tirk êrîş dikin. Di çeperên şer de jî ev yek tê nîşandan, wekî tê dîtin dema çeteyên wan dikevin nav destên şervanan de ev yek tê xuyakirin. Bikaranîna van çeteyan ji hêla dewleta Tirk ve ne tiştekî nû ye, li Lîbiya, Ezerbîcan, Okraniya û hwd… ev çete ji bo armancên abûrî hatine bikaranîn. Niha jî tevî ku gelek jêderan dan xuyakirin ku dagirkeriya Tirk fonan nade çeteyan, lê dîsa komên çete tên neçarkirin ku êrişî gelên herêmê bikin. Lewma jî bi armanca parastina gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê şervanên QSD'ê berxwedaniyeke bêhempa didin meşandin. QSD û YPJ'ê li Tişrînê bûne artêşeke efsûnî mîna Rustemê Zal û Kawayê Hesinkar, bi lehengî destanên şer dinvîsînin.

**Yekîtî û karê diplomasî QSD'ê bêhztir dike**

Piştî rûxandina rêjîma Baas a ku bi dirêjahiya 60 salan zilm û zordarî li gelên Sûriyê bi taybet gelê kurd kir. Êdî Sûriyê derbasî qonaxeke aloztir bû. Ev bêtirî mehekê ye ku ev rêjîm bi erêkirina hin dewletên xwecihî û herêmî hat rakirin. Jê û bi şûn de tevgera siyasî ya kurdî li Rojava, Sûriyê û ya diblomasî li cîhanê kete tevgerê. Arman cê ew e ku nimûneya Rêveberiya Xweser wekî şêweyek ji bo rêvebirina Sûriyê ji bo cîhanê bidin pêş. Ji hêlekê ve Rêveberiya Xweser li hundur xebatê dike, nemaze MSD'ê banga xwe dike ji bo lidarxistina kongreyeke netewî-sûrî. Di heman demê de bi riya xebatên Desteya Têkiliyên Derve jî karê diblomasî dide meşandin. Ji hêleke din ve partiyên kurdî li Rojava hewldana yekrêziyeke kurdî dikin. Hewldanên yekrêziya kurdî û li nik wê jî xebata diblomatîk hêz û moraleke xurt didin şervanên QSD'ê. Lê tişta ku kurdên li Ewrpa û dewletên din ên cîhanê kêm dimînin ew e ku piştgiriya QSD'ê, Kobanê û Rêveberiya Xweser bi rengê ku tê xwestin, nayê kirin. Pêwîste gelê kurd li tevahiya cîhanê ji bo piştgiriya QSD'ê û li dijî dewleta Tirk a dagirker mîting, civîn, meş û hemû cureyên berxwedanê bi kar bînin.

**Geşedana asoyên çareseriyê, li dijî wê jî hewldanê dagirkeriyê**

Wekî em dizanin bendav cihekî istratejîk e, gelên herêmê sûdeke mezin jê dibîne, lewma jî dagirkeriya Tirk dixwaze wê dagir bike û gel bê elektrîk, çandinî û debarên jiyanê bihêle. Herwiha bi riya dagirkina bendavê jî êrişî Kobanê



û deverên din jî bike. Di heman demê de bi hincetên dûrî rastiyê êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bike. Bi dehê caran Rêveberiya Xweser insyatîfên çareserî û aramiyê pêşkêşî dewletên hawirdor û di nav de jî Tirkiyê kiriye. Lê ev insiyatîf bêbesiv mane, niha jî dewleta Tirk dixwaze pilanên dagirkeriyê bide meşandin. Erdogan hewl dide pilanên dagirkeriyê dûrî sînorê xwe pêk bîne û haya wî ji hundirê sînor tune ku volkanek di nava Tirkiyê de geş dibe. Rêveberiya Xweser û QSD'ê ne qels û lawaz in mîna ku Erdogal dinere. Hêjayî gotinê ye ku pirojeya neteweya demokratîk çareseriyeke ji bo pêşeroja Sûriyê û ew ê hemû pirsgirêkên li Sûriyê çareser bike. Herçiqasî Rêveberiya Giştî ya QSD'ê Mezlûm Ebdî bi daxuyaniyan banga rawestandina operasiyonan kir, lê dagirkeriya Tirk û çeteyên xwe êrişan li derdora Bendava Tişrînê didomînin. Her çendî daxuyaniyên hêzên navnetewî lawaz in, lê berxwedaniya gel û QSD'ê ya li Bendava Tişrînê bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî, di lûtkeyê de ye.

# Çareseriya herî rasteqînî li Sûriyê pergala konfederala demokratîk e!



**Hakki Tekin**

Li Sûriyê di 8'ê Kanûnê de rejîma Baasê hilweşiyaye û qonaxeke nû dest pê kiriye. Niha wekî gava destpêkê, ji bo ku li Sûriyê şerê navxweyî bi dawî bibe û ev pêvajo bi agirbesteke berfireh veguhere aştiyeke mayende xebat tên meşandin. Piştî ku ev pêvajo bi pêş bikeve, di mijara ku wê şiklê nû yê dewleta Sûriyê û rêveberiya wê çawa bibe, rejîma siyasî û civakî çawa şikil bigire de wê nîqaşên berfireh werin meşandin.

Di rewşa heyî di Sûriyê de, komên îxwanî, cîhadîst û selefî ku dewleta Tirk destekê dide wan, bi zêhniyeta xwe ya heyî, ti pêşeroja wan tine ku pêşkêşî Sûriyê û herêmê bikin. Hebûna wan a li Sûriyê, wê bibe sedema kaos, tevlîhevî û malwêraniyê. Tê zanîn ku ew ê li welatekî wekî Sûriyê gelek çand û bawerî lê dijîn, bi feraseta xwe ya yekperest û navendîperest pergaleke şerîatê ava bikin. Fikr û feraseta wan a dewlet û civakê ev e. Her çendî şertûmercên niha yên navneteweyî derfetê nadin vê jî, mejî û zêhniyeta wan tenê têra vê dike. Li ti derê nehatiye dîtin ku Îslama Siyasî û Îxwanî li gorî zêhniyeta demokratîk bimeşe, tenê dikarin bi şiklekî pragmatîst tevbigerin. Ji ber vê yekê, armanca HTŞ'ê ew e ku tengasiya heyî derbas bike. Aşkere ye ku ev zêhniyet û rewş ne tenê ji bo gelên Sûriyê wê bibe kareset û felaket, ew ê ji bo Rojhilata Navîn û cîhanê jî bibe felaketeke mezin. Sûriyê ji aliyekî ve ji bo ku ji dîktatoriyekê xwe xelas bike têkoşîn dimeşîne, lê ji aliyê din ve bi xetereya modêla dîktatorî ya bi dehan rêxistinên cîhadîst ên mezin û biçûk re rû bi rû ye. Her wiha dîktatoriya Baas'ê li Sûriyê têkçûye lê vê gavê li Sûriyê valahiyeke mezin heye. Ev jî nîşan dide ku nîqaşa bi hev re were meşandin û modêla pergala siyasî û paradîgmaya demokratîk, ekolojîk, azadiya jinê di çi astê de girîng e.

Ji bo Sûriyê, feraseta pergala siyasî ya herî rasteqînî modêla pergala konfederal demokratîk e. Li Bakûr û Rojhilatê Sûriyê di pêvajoya şoreşa 13 salan de danehev û tecrubeyeke mezin hatiye bidestxistin. Dîsa modêlên demokratîk ên li cîhanê pêşketine jî hatine lêkolînkirin û di rewşa heyî de ew derfet derketiye holê ku li gorî xweseriya Sûriyê, modêleke nû were pêşxistin. Ji vê cudatir, pêwîst e ji tecrûbeyên pergalên federalî, eyalet û xweseriyê ku li cîhanê wekî modêlên rêveberiyê bi pêş ketine jî sûd were girtin. Ji ber ku pêkhateya civakî, demografîk, coxrafîk û etnîk, û pêkhateya wê ya pirrengî ya baweriyên heyî, lêkolîna li ser tecrûbeyên li cîhanê jî dabû hewcekirin. Mînak welatên ku li wê derê gelek etnîsîte hene yên wekî Belçîqa, Îspanya, Kanada, Endonezya û Bosna Hersek, bi şiklekî federalî, xweser û pergala eyaletê tê bi rêvebirin. Pergalên federatîf û eyaletê, li welatên wekî DYE, Almanya, Brazîlya û Awûstûryayê, sînorên coxrafîk esas digirin û li gorî wê tên birêvebirin. Pergalên federatîf, xweser û eyaletê, li welatên wekî Swîsre, Îspanya, Kanada, Çîn û Hindistanê li gorî ku rengîniyên etnîkî û coxrafîk bigihînin hev bi pêş ketine. Van welatan, faktorên wekî etnîsîte, bawerî û coxrafîk li ber çav girtine û modêlên hê berfireh ku rengên cuda li cem hev dihewîne bi pêş xistine.

Bi têgînên wekî federatîf, xweserî, eyalet û rêveberiyên xwecihî, armanc ew e ku modêlên cuda yên xwe dispêrin etnîsîte, bawerî û faktorên çandî yên cuda werin naskirin. Dîsa li gelek welatan li cem pergalên federasyonê, eyalet hene; di pergalên ku xwe dispêrin eyaletan de jî, çendek pêkhateyên federe hene. Ev balkêş in. Ev tecrûbe, dikare bi feraseta demokratîk konfedere re hev bibîne, modêleke konfederalîzma Sûrî ya xweser û demokratîk were pêşxistin. Ev modêl di pêvajoya nû ya Rojhilita Navîn de di asta pêşengiyê de wê bibe mînakek sînerjî û pergalê. Eger em karibin vê modêlê bi civaka navneteweyî baş bidin naskirin, dikare destekê bistîne. Modêla ku em ê li şûna feraseta cîhadîst, îxwanî û selefîst pêşniyar bikin, dibe ku ji cîhanê re hê balkêştir were. Îro hebûna vê zêhniyeta cîhadîst, ji bo ku em vê modêlê bidin qebûlkirin, derfeteke destdayî pêşkêşî me dike. Çawa ku Bakûr û Rojhilatê Sûrî di encama têkoşîna li dijî zêhniyeta cîhadîst û îslama Siyasî çêbûyîbe, modêla demokratîk konfederal îro jî li beramberê hêzên xwediyê heman zêhniyetê bi şiklekî mayende, dikare veguhere modêla rêveberiya hemû Sûriyê. Eger ne îro be, ma kengî? Ev ne xeyalek e. Her wiha nayê taloqkirin û niha ye.

# Hişmendiya netew-dewlet pirsgirêkên Tirkiyê kûrtir dike

Rojnamevan Nîhat Kaya, helwesta dagirkeriya Tirk ya ragihandina şerê taybet li hemberî hevdîtinên Rêber Apo rexne kir û wiha got: "Aloziyên li Rojhilata Navîn, bi taybet li Sûriyê bi riya gurkirina hestên netewperestiyê û hewildanên valaderxistina aştî û demokrasiyê ne. Dagirkeriya Tirk jî bi riya ragihandina şerê taybet vê yekê pêk tîne."

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Derbarê bûyerên li Sûriyê diqewimin, şerê taybet yên li ser dezgêhên çapemeniyê yên dewleta Tirk ya dagirker tê meşandin û giringiya hevdîtinên li gel Rêber Apo di asta Rojhilata Navîn de, rojnamevan Nîhat Kaya bersiva pirsên rojnameya me da û naveroka hevpeyvînê wisa bû:




- Bi hilweşandina Rejîma Baas'ê serdemek nû li Sûriyê destpêkir, dê ev guhertina ji bona siberoja herêmê çi bi xwe re bîne?

Di sala 2009'an de, bi pênaseya Rêberê gelan Rêber Apo "Bihara Gelan" destpêkir û hêdî hêdî bingeha avakirina herêmê nûve hat avêtin. Bi Tinûsê, Misrê, Lîbya û taybet jî Sûriyê hemanên gîring rû dan. Sûriyê de zêde di aliyê gûhertinên desthilatîyê de di wê demê zêdê guhertin pêşneketin. Di sala 2011'an ve bandora xwe li Sûriyê jî kir. Wê demê rejîma Baas'ê bi pêşveçûnên herêmên ereban û ketina desthiladarên li herêman serweriya xwe komî liserhev kir. Bi hatina çeteyên DAIŞ'ê re, ji bona xwe hişmendiya Islama radîkal biparêze, di aliyê çekdarî de, hewil da xwe xurt bik e. Lê nekarî hemberî tûndî û komkûjiyên DAIŞ'ê û komên çeteyên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker berxwe bide û şer bike. Hêdî hêdî, bingeha rûxandina xwe avakir. Destpêkê ji aliyê Idlibê ve, HTŞ'ê hat û leşkerên girêdayi rejîme Baas'ê berxwe nedan û pêşdeçûn bajarên girêdayî rejîmê ket bin serweriya HTŞ'ê û komên çete yên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker. Rejîma Baas'ê heya niha bi alîkariya Rûsya û Îranê li ser piya mabû. Piştî ku Rûsya û Îranê jî hêza xwe kişand bibaweriyek mezin di nava artêşa rejîma Baas'ê de ava bû. Ev jî bû sedem ku leşker şer nekin û bajarên herî stratejîk weke Heleb, Şam û Lazkîyê jî dagirkeriyê ve rû bi rû bihêlin. Lê yên ku Rejima Baas'ê têkbirî kî ye? Dê pêşerojê ev yek xuya bike, ji ber hêzên weşartî di nav wê leyistokê de cîhgirtin. HTŞ'ê a ku qala wê tê kirin û rojeva me dagirtiye, hêzekî selefîye û ji Al-Qaîdê qût bûye. Ev jî wek çeteyên DAIŞ'ê bi hişmendiya Îslama tûndirew tê rêvebirin. Ji xwe di ragihandinê da jî xuya bû, Colanî yanî Ebû Mihemed El Colanî bi hişmendiya zilam salar û mêrê serdest destê jina nagire û bi jinên ser vekirî re wêne nakişîn e. Têgeha perwerdê gor şerîeta olî tê amade û plansazî kirin. Pergala zagonsazî jî heya gor mercên şerîatê amade dikin. Her kiryarên wan netewparêziya hişk tê rêvebirin. Ev desthilatiya niha Şamê rêvedibe, domandina hişmendinya DAIŞ'ê ye. Ev desthilat jî ne domdar e. Ji ber ku hişmendî û birdozîya wan wek ya rejîmê Baas'ê berjewendiyên gel bingeh nagire, ne ji bona gel e. Raste ji ber hêzên desthiladar û metinger niha ji ber HTŞ'ê rêveberiya demkî ya Şamê ye, danûsitandin tên kirin û karê diplomasî ji bona berjendiyên xwe didin meşandin. Lê kiryarên ku HTŞ'ê û komên çeteyên din yên dagirker pêk anîn, ji yên rejîmê Baas'ê ne cûdatirin. Ev hişmendî berdewam bike, dê Sûriyê beriya 2011'an xirabtir bibe û ev metirsiyek mezin dide avakirin. Bi aliyên olî ve pêkhateyên li Sûriyê ne tenê Islamî ne, pêkhateyên cuda li axa Sûriyê de jiyan dikin. Gelo HTŞ'ê bi vê hişmendiya xwe wê bikare Sûriyê tevahî rêvebib e? Ji ber vê yekê li Sûriyê tevahî de, pêwîstî rêveberiyek demokrat û ya gel heye. Ramanên Rêber Apo ya Netewên Demokratîk yên pêkhateyên cuda di nav hev de jiyan dikin teqez dikare vê pêk bîne. Ji ber ezmûnek li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava bûye.

- Hûn wekî rojnamevanekî ku rewşê ji nêz ve dişopîne, şerê taybet û derûnî yê li ser dezgehên ragihandin û çapemeniya dewleta Tirk ya dagirker çawa dinirxînin?

Hêzên ku pêşiya aloziyên Sûriyê vedikin û xwe bi navê cuda rêxistin dikin, di bingeh de dewleta Tirk ya dagirker e. Ev hevkariya çeteyên girêdayî xwe, dijî rejîma Baas'ê rêxistin kirin û di nav gel de metirsî dan avakirin dewleta Tirk ya dagirker bû. Dewleta Tirk ya dagirker bi her çar parçeyên Kurdistanê de, qirkirin û tunekirina gelê Kurd e. Armanca van ne parastina sînoran, ne jî anîna demokrasiyê ji bo Sûriyê ye, armanca wan ya bingehîn têkbirina deskeftiyên kurda ne. Ev dijminahiya hemberî kurdan ne demekê kurte. Ev hişmendiya kevnar ya beriya Osmanîya ne. Serhildanên Kurdan yên destpêke de, serî li her cure komkujî û qirkirinan dan. Lê nekarîn pêşiya serhildan û têkoşîna gelê Kurd bigirin. Hemberî Tevgera Azadiyê nekarîn bi ti awahî agirê azadiyê vemirînin. Hîn gerîla û Tevgera Azadiyê ser piyan e. Dewleta Tirk ya dagirker roj bi roj paş dikeve û ber bi hilweşandinê ve diçe. Ger ku serî li çareseriya pirsgrêka Kurd û rakirina tecrîdê daba, dê biba hêzekî sereke ya di nav giştî cîhanê de. Lê hêza destê xwe ya heyî tenê ji bona têkbirina kurdan bikar tîn e. Vê carê kiryarên nekarî bi fizikî û çekdarî bike, serî li şerê taybet û derûnî yê ragihandinê dide. Ji ber civaka AKP-MHP'ê têk çûye. Ji ber raya giştî veşêrin binketina xwe serî li gurkirina netewperestiyê didin. Kuştina hezaran leşkerên xwe ji malbatên wan vedişêrin. Li ser ragihandina xwe van kiryaran nabêjin. Mirovên hilbijartî şerên taybet didin pêş rastiyê de ev endamên Istixbarata Tirk ya MIT'ê ne. Lê wê rastiyê cîhan giştî agahdare ku dewleta Tirk ya dagirker şerê hemberî kurdan Tevgera Azadiyê de têkçuyinekê jiyan dike. Ji ber wê yekê li ser wê yêkê dide li ser ragihandina xwe aloziya di navbera gelan de ava dike û dijmintiyê pêş dixe.



- Di 28'ê Berfanbara 2024'an de desteya Dem partî li gel Rêber Apo hevdîtinek pêkanîn, hûn girîngîya naveroka wê hevdîtinê çawa dibinin û dê çi pêşketin xwere bîne?

Dewleta Tirk ragihandina xwe de, wek li hemberî Tevgera Azadiyê qaşo serketiye û têkbirîye radigihine. Lê berovajî vê, carekê da hevdîtinên li gel Rêber Apo kirin rojev. Serokê Partiya Netewperest (MHP'ê) Dewlet Bahçelî axaftinek kir û got bila Rêber Apo bê parlementê daxuyanî bide ji bona PKK'ê û hêzên Tevgera Azadiyê çek berbidin. Ev axaftin ne berxwede hate kirin. Demekê kurt piştî wê axaftinê meha Cotmeha 2024'an de biraziyê Rêber Apo û Parlementerê Dem Partî yê bajarê Riha yê Omer Ocalan çû Imraliyê li gel Rêber Apo hevdîtin kir. Di heman demê de desteya ku parlementerê Dem Partî Sirri Sûreya Onder û Pervîn Buldan piştî demekê hevdîtin li gel Rêber Apo pêk anîn. Em mêze bikin ger hûn serkeftinê jiyan dikin hûn çima carekê da hevdîtin pêkanî? Ya rastiyê de ev hevdîtina li gel Rêber Apo encama têkoşînek mezin a Rêber Apo, Tevgera Azadiyê û gelê welatparêz yê berxweder e. Çiqasî hewildan ku ji bona wê têkoşînê bi rêya şerê taybet holê rabikin jî nekarîn. Ev hevdîtin pêşî li girtina xitimandinên pirsgrêkê li Rojhilata Navîn vekirin e. Mifteya çareserîyê li gel Rêber Apo ye. Di Şerê Cîhanê yê yekem de pisrgreka Kurd li Rojhilata Navîn û cîhanê de pirsgrêka sereke ye. Pirsgrêka Kurd neyê çareserkirin pêşketin li Rojhilata Navîn çê nabe. Ev navê wê bikin çi, bila bikin lê tekane rêya çareseriyê pirsgirêka Kurd û muxatap jî Rêberê gele Kurd Rêber Apo ye. Ji ber her çar parçê Kurdistanê jî, ji ber hêzên hegemon û desthilat xwe nêzî çareserkirina pirsgirika Kurd nakin hertim alozîyên nexweyî ve rû bir û dimînin. Berê da jî gelek hevdîtin bi Rêber Apo re hatin kirin, Rêber Apo gelek caran jî ev nêzîkatiyên aşitîyane nêz dewleta Tirk ya dagirker û aliyên azadîxwaz bû lê her carê dewleta Tirk bi hişmendîya xwe ya netewperest hewildanên Rêber Apo yên çareseriyê wala derxistin. Raste hikûmeta AKP-MHP'ê li Tirkiyê pirsgirêkek mezin ya demokrasiye jiyan dikin, bi hevdîtina Rêber Apo re çareser bikin. Em jî bi hêvîne wê carê çareseriyek mayinde pêk bê û dê Rêber Apo bi fikir û ramanên xwe pêşengtiya wê bike.

## Berxwedana Bendava Tişrîn û Qereqozaqê!



**Dilyar Cizîrî**

Di dawiya sala 2024'an de Heyet Tehrîr El-Şam (HTŞ) navê berê Cebhet El-Nusra ku li ser lîsteya terorê ya navdewletî bû, li Helebê dest bi êrişa girtina Helebê kir. Hêzên Artêşa Sûriyê xwe li ber êrişa çekdarên HTŞ'ê ne girtin û di nava çend rojan de Heleb ket destê wan. Piştî Helebê bajarên Sûriyê yek li pişt yekî ket destê çekdarên HTŞ'ê, herî dawî Serokê Berê yê Sûriyê Beşar El-Esed reviya û desthiladariya Şamê ket destê çekdarên HTŞ'ê.
Bi vî rengî piştî zêdeyî 53 salan ji desthilatdariya rêjîma Baas pêvajoyeke nû li Sûriyê destpê kir. Dewleta Tirk beriya her kesî xweset ji vê rewşê sûdê werbigre. Ji lewra bi dehezaran çeteyên xwe yên ku hejmarek mezin çeteyên Ozbek, Tirkistan, Çeçen û her wekî din xistin dewrê û di bin sîwana HTŞ'ê de ew herêm xist bin kontorla xwe.
Li aliyê din çeteyên xwe yên di bin navê "Artêşa Niştimanî" li dijî Kantona Efrîn-Şehbayê xistin dewrê û êrişeke berfireh dan destpêkirin. Rêveberiya Xweser di rewşa guhertin û veguhertina bi lez çêbû, ji bo parastina sivîlan, demil dest koçberên Efrînê ku ji sala 2018'an de li Şehbayê bi cih bibûn, anîn herêmên bi ewle yên Rêveberiya Xweser.
Dewleta Tirk û çeteyên wê xwe wiha nîşan dan wan serkeftinên mezin bi dest xistine. Îcar êrişa xwe ber bi Minbic û Bendava Tişrîn, her wiha Pira Qereqozaq ve jî anîn. Piştî berxwedaneke dîrokî û bi navbênkariya Koalîsyona Navdewletî bi serkêşiya Dewletên Yekbûyî yên Amerîka agirbest li Minbicê hate destpêkirin. Lê dewleta Tirk û çeteyên xwe ku wiha xeyaldikirin wan bayê serkeftinê li bakiriye û wê koka Rêveberiya Xweser û QSD'ê bihejîne.
Li gorî plana wan ji Çiyayê Kizwanan û Tebqayê jî êriş kirin û xwestin bi yek hêzê li hindir jî şaneyên DAIŞ'ê û komên girêdayî xwe bixin tevgerê. Wiha xeyal dikirin, çi li serê rêjîma Beşar El-Esed hat, wê li serê Rêveberiya Xweser bînin.
Ema di vir de Berxwedana Bendava Tişrînê hemû hesabên wan vala derxist. Şervanên YPG, YPJ/QSD'ê li Tişrîn û Qereqozaq û beriya li Kizwanan û Dêrhafirê evsaneyên dîrokî nivîsandin. Derbeyên mezin li êrişkaran xistin û êrişên wan vala derxistin.
Dewleta Tirk piştî têkçûnê giranî da Bendava Tişrîn û Qereqozaq û hemû hêza xwe xist dewrê ku wan herêman dagir bike. Ema şervanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hemû êrişên wan têk birin. Tevî metirsiya hilweşîna Bendavê dewleta Tirk hîn jî bi balafirên şer û hemû cûreyên çekan êrişên xwe didomînin. Berxwedana şervanan û têkbirina êrişan didomînin. Bi vê berxwedana şervanan û kombûyîna gel ku mertalên zindî li bendavê çêkirin, hemû hesabên dewleta Tirk û çeteyên wê dan guhertin. Hêzên navdewletî û herêmî êdî ketin ferqê bêyî îradeya gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne mumkine aloziya Sûriyê çareser bibe. Heger di nava çend rojan de em dibînin xebateke diplomasî ya mezin li herêmê heye. Heger em dibînin Berdevkê Serokê PDK'ê Mesûd Berzanî hatiye serdana Rojava, heger mafê kurdan di Sûriyê de bûye mijara sereke ya hemû saziyên ragihandinê û şandeyên tên Sûriyê, ew encama berxwedana Bendava Tişrînê û şervanên wê ye.



# Îmralî çareseriya aloziyên Rojhilata Navîn e

Rojnamevan Stêrk Gulo bal kişand ser girîngiya hevdîtinên DEM Partî bi Rêber Apo re û wiha got: "Îmraliyê kilîta pirsgirêkên Rojhilata Navîn e, eger ew çareser bibe wê pirsgirêkên Rojhilata Navîn jî çareser bibin."

**Amara Baran/Qamişlo**

Stêrk Gulo balkişand ser hevdîtina DEM Partî bi Rêber Apo ku 28'ê Kanûnê pêk aht û wiha got: "Hevdîtina ku DEM Partî bi Rêber Apo re pêk anî li ser heft xalên girîn pêk hat. Berxwedana ku li Îmraliyê dihat meşandin û pêgava azadiya fîzîkî ,ket sala xwe ya duyemîn de ku tevahî gel bi gelek kesayetên demokratîk ve rewşenbîr û kesên ku xelata nobelê girtine bi vî rengî mesaj dan ku azadiya civak, mirov û jinan bi azadiya Rêber Apo ve girêdyî ye. Di Rojhilata Navîn de gelek guhertinên bilez çêbûn, Rêber Apo bi xwe jî di hevdîtina xwe de dibêje ku "Eger çareserî nebe ew êrîşên ku çêdibin wê bibin wek gêrgêrîkê di bedena civaka Rojhilata Navîn de." Rêber Apo dixwaze vê çareser bike bi xwe jî got "Ez ji bo çareseriya mayînde çi bê xwestin hêza min jî heye û ez amade me." Di vê pêvajoyê de hevdîtina bi Rêber Apo re hêza çaresereyeke bingehîne ku herkes bikaribe xwe lê bigre û liser bimeşin. Yên ku herê zêde vê rastiyê naskir dewleta Tirk bi xwe bû ku bi lêz xwestin li Îmraliyê hevdîtin çêbibe. Ger ew vê neke sîstema wî ya heyî û nîjadperestiya ku dane avakirin ber bi hilweşandinê ve diçe. Îro em dibînin ku derdora Tirkiyê bûye agir, ew agirê ku Bexçelî û Erdogan pêxistine ew ê bi xwe jî tê de bişewitin."



### 'Çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn li Îmraliyê ye'

Stêrk Gilo axaftina xwe wiha domand: "Îmralî îro kilîta aloziya di rojhilatanavîn dê ye, ger ew çareser bibe wê pirsgirêkên Rojhilata Navîn jî çareser bibin. Îro ew kirîza ku li Sûriyê, Lubnanê û heta iraqê jî wê li Tirkiyê weke volkanekê biteqe, piştî ku biteqe Tirkiyê nikare pêşiya wê bigre. Ji ber ku Tirkiye bi xwe jî li ser sîstemeke yek alî a bi tene hatiye avakirine, ne li ser bingeha demokratîk hatiye avakirin. Ew sîstem wê Tirkiyê ber bi xeteriyên mezin ve bibe heta çareserî jî jêre çênabe. Berdewamkirina hevdîtinan li Îmraliyê wê ji bo herkese bibe derman ku rê li pêşiya xwînrijandin û fitneya di navbera pêkhateyan de bigre û tevahî herem bi rengekî demokratîk bi nasnameya xwe jiyan bike."

### 'Rêber Apo rehîneyek siyasî ye'

Stêrk Gûlo da zanîn ku dewleta tirk bi xwe jî rêya çareseriyê di îmraliyê de dibîne û wiha li axaftina xwe zêde kir: "Ew hêza Tirkiyê nîne ku kirîza heyî çareser bike. Bi mîlyonan însan derketin kolanan û bang kirin ku çareserî li Îmraliyê ye. Pêwîste hevdîtinê bi Rêber Apo re vegehûre yasayî ku Rêber Apo wek rehîneke siyasî hat girtin û tu aliye wî yên hiqûqû tunebû, demildest pêwîstî bi azadiya Rêber Apo heye. Wek ku Rêber Apo dibêje "Pirsigirêka min ne pirsgireka kese, pirsgirêka min pirsgirêka hebûn û nasnameya gelekî ye,". Ji bo wê jî li Îmraliyê hewildanên Rêber Apo ji bo pirsgirêka kurd, pirsgirêka jinan û pirsgirêka pekhateyan wê bibe wek mertal li pêşiya kirîza heyî û çareser bike. Di vî pêvajoyê de bilindbûna dengê jinan jî girînge ku bibe hêza çareseriyê ji bo hemû jinan ku wek netew hevdû bigrin. Çawa ku herkes Îmraliyê wek rêya çareseriyê dibînin, ji bo me tevahî jinan jî wê bi vî awayê be. Divê ev hevdîtin neyên sekinandin. Wê sala 2025 bibe sala azadiya Rêber Apo."

### 'Destgehên şerê taybet xwe di şeran de birêxistin dike'

Stêrk balkişand ser hedefgirtina rojnamevan û wiha got: "Di şerê li Rojavayê Kurdistanê de, yên ku li kêleka şervanan di xeta herê pêş de bû xwedî ked çapameniya azad bû. Hêzên hegemon di bin daîra şerê taybet de ku xwe birêxistin kiriye di tevahî şeran de. Herî dawiyê jî di êrişên çeteyên dewleta Tirk ku 8 kanûnê destpêkiribû li Minbicê Şerê taybet jî pêre ket tevgerê. Dewleta tirk bi rêka çapemeniyê şerê pîsoklojîk li ser gelan dide meşandin."

### 'Li hemberî şerê taybet rola Ragihandina Azad girînge'

Stêrk diyar kir ku di vê pêvajoyê de gelek dezgehên ragihandinê bi agahiyên derew dixwestin serê gel tevlîhev bikin, bi vî şêwazî şereke mezin bidin meşandin û wiha domand: "Li beramberê van êrîşan rola ragihandina azad jî girîngbû ku îro li Kurdistanê li ser hişmendiya derxistina rastiyê û maskeyên qirêj yên dagirkeriyê derxistin ber çavan. 2 rojnamevanên çapeniya azad heta hênaseya xwe ya dawiyê ji bo ku rastiya şerê dagirkeriyê derxînin ber çavên cîhanê bi awayek fedaiyane di çeperên şer de clhê xwe girtin. Rojnamevan Cîhan Bîlgîn û Nazim Daştan di vî şerê hovane de gihaştin asta şihadetê. Herdû heval jî şervan û fedaiyên xeta heqîqetê bûn ku di eniya yekemîn de cîh girtin, dema ku êrîşê dagirkeriyê destpê bû herdû heval jî bi israr xwestin ku berxwedana şervanan û ya jinan di xeta destpêkê de bişopînin."

### 'Şehîd Cîhan bû dengê jin û zarokan'

Stêrk behsa fedekarî û berxwedaniya şehîd Cîhan kir û got: "Cîhan wek rojnamevanekê 8 salan di dezgehên çapemeniya azad de xebat meşand û tu carî ji xeta xwe venegeriya. Heval Cîhan yek ji hevalên ku destpêkê bere xwe da şoreşa Rojava û xwest bibe dengê gelê azadîxwaz, jin û zarokan tu caran kamereya xwe dananî. Cihê hertim bi riheke çalak tevgeriya. Heval Cîhan di qada çapemeniyê de bi rihê berxwedan û parastinê jiyan dikir."

### 'Şehîd Nazim bi pênûs û kamereya xwe rastiya dagirkeriyê derxist holê'

Stêrk Gulo behsa kesayet û fedekariya Şehîd Nazim Daştan jî kir û wiha anî ziman: " Şehîd Nazim li Bakurê Kurdistanê di nav malbatek welatparêz de mezin bibû. Ew di şoreşa Rojava da bû xwedî roleke mezin ji bo pêşxistina qada çapemeniyê ku bibe dengê gel. Di berxwedana Kobanê de yên ku bi fotoya ispatkir ku dewleta tirk bi DAÎŞ'ê re hevalbende, heval Nazim bû. Heval Nazim wek rojnamevan û miroveke kedkar bû. Di jiyanê de hertim lêkolîn dikir û hertim li pey heqîqetê bû. Wî bi xwstek û heycaneke mezin berê xwe da qada şer hertim rihê wî amadebû. Digot ku çiqas li Kurdistanê dagirkerî hebe em bi pênûs û kamerayên xwe dikarin wî dagirkerî derxînîn holê ku bibin hêz ji bo şervan û gelê xwe. heval Nazim ne tene rojnamevaneke kurdîstanî bû rojnamevanê rojhilata navîn bû. Wek rojnamevan erka ku dikeve ser mile me kamera û pênûsên wan li erde nehêlin û li ser şopa wan bimeşin."

## Yên ku hêza wan nîn be, nikarin aştiyê pêk bînin



**Zekî Bedran**

Dewleta Tirk dijminahiya xwe ya li hemberî Kurdan bênavber didomîne. Çeteyên bi navê SMO (Artêşa Sûriyê a Niştimanî) êrîşî herêmên Rêveberiya Xweser dike. Çete bi serê xwe nikarin berxwedaniya QSD'ê têk bibin. Di heman demê de, ev şer ne şerê wan e. Di nav van de, diz û yên hatine pişaftin jî hene. Piraniya wan bi netewên weke Ûygûr, Ozbek, Çeçen hwd. her wiha gelek kesên ku ji rêxistinên weke DAIŞ û El Nûsrayê qutbûne jî pêktên. Bajarên ku di aliyê wan çeteyan hatine dagirkirin, ji gelê Kurd re mafê jiyanê nehiştin e. Mal û milkên wan hatin desteser û talankirin. Weke ku tê dîtin ti bîrdozî, fikirandin û armanca wan çeteyan tine ye. Dizî û talan kirin, kirine debara rojane ya jîyanî. Dewleta Tirk wana ji bona berjewendiyên xwe bikartîne, ji ber ku ev komên çete ne bidispilîn tevdigerin û ji bo armancekê şer nakin, nikarin xwe li hemberî QSD'ê ragirin. Ji ber vê yekê jî, dewleta Tirk ya dagirker rêya esmanî ji bona wan vedike û bi alîkariya çekên giran jî şerê tê kirin koordîne dike.
Dewleta Tirk niha jî, ji bona PKK'ê re lihevbike û çekan ji holê rabike desteyek şandine li Îmraliyê. Ev deste bi hemû partiyên li parlementê re hevdîtin pêk anî û der barê projeya çareseriyê ya Rêber Apo de agahdar kirin. Qaşo biratiya Kurd û Tirkan didin avakirin. Lê li aliyê din bi awayekî hovane hewl didin QSD'ê têkbibin û hêza berxwedanê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bişkînin. Bi dijminatiyeke bêhempa hewl dide bi HTŞ û hêzên din re Kurdan ji derveyî pêvajoya çareseriyê bihêle. Zext li ser HTŞ û hêzên din dike ku demildest QSD'ê bê çek bike û bêhêz bixin. Cîhan dibêje ku divê şer û pevçûnên li Sûriyê rawestin, lê dewleta Tirk ya dagirker bi çeteyên xwe êrîş dike û hewl dide HTŞ'ê bi awayekî çalaktir tevlî şer bike. Ew di rastiyê de, hewl didin ku wan radest bikin ji ber ku ew alîkariya HTŞ'ê dikin. Dixwazin HTŞ'ê bixin bin serweriya xwe, li ser Sûriyeyê parêzgeriyekî ava bikin û wê bikin berfirehkirina polîtîkayên xwe. Her wiha ji bo ku Kurd li ber çavê welatên Ereb û hêzên weke DYA nebin xwedî maf, xaçperestiyê dikin. Hemû hewldanên wê li ser astengkirina kurdan û dûrxistina wan ji pêvajoya siyasî ya Sûriyê re xerc dikin.
Tirkiye li şûna ku pirsgirêkên bi kurdan re bi rêyên aştiyane çareser bike, hewl dide rêxistinên wan ên heyî tasfiye bike. Tirsa wan a herî mezin ew e ku kurd hişyar bin û xwe birêxistin bikin. Ji ber ku têkbirina gelên rêxistinbûyî û berxwedanê ne hêsan e. Dewleta Tirk zêdetirî 40 sal in di nava şer de ye. Artêşa mezin a NATO û çekan a ku heye bikar tîne. Wî bi deh hezaran mirov kuştin lê nekarî di şer de bi ser bikeve. Nikarîbû pêkhateyên Kurdan ên birêxistinkirî belav bike. Niha jî bi gotina aştî û biratiyê hewl dide vê pêk bîne. Helbet tenê bi şerê derûnî û lîstokan ne gengaze ku vê yekê pêkbînin. Kurd di vî warî de hişyarin û xwedî ezmûnê kevnarin.
Di weşana vê propagandayê de êdî ji her demê bêhtir dîplomasî xistine meriyetê. Ji bo vê jî êrîşên xwe yên leşkerî zêde kirin. Li ser gelê Kurd û hêzên pêşeng ên demokrat û azadîxwaz zextên piralî tên kirin. Neçarin ku gelên ku li Sûriyê jiyan dikin ronî bikin û wana derheqê pêvajoyê de agahdar bikin. Bi şêwaza bisekine û meyze bike kiryar çareser nabin. Hêzên hember ger ku xwe rêxistin û plansaz kir, guhertina wê jî zehmetir dibe.
Di destpêkê de gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bona herêmên xweser xwedî pergalekî demokratîk bibe pêwîste ji pêvajoyê re pêşengiyê bikin. Ji bo vê jî xebateke xurt pêwîst e. Bêyî xebateke berfireh a çapemenî û dîplomatîk, zehmet e ku mirov li navxwe û derveyî welat bi ser bikeve û piştgirî bigire. Ji bo ku di dîplomasî û siyasetê de bi bandor be û encam bigire, pêwîst e di her qadê de bi hêz be, ango hêza xwe ya leşkerî zêde bike. Ji bo rawestana li hemberî hêzeke wêranker, mîlîtarîst û dagirker a weke Tirkiyeyê, ti rêyeke din nîne. Tirkiye hewildide ku hişemendiya netewdewletê li Sûriyê avabik e. Rejima Baasê hat rûxandin, lê HTŞ'ê cihê wê girt. Rêveberiya Xweser di bin gef û êrîşeke mezin de ye. Rêveberiyê jî seferberî îlan kir. Li gorî vê divê hêza xwe ya leşkerî zêde bikin û sermayeyên xwe biparêzin. Bêyî ku li qadan bi hêz bin, di qada dîplomatîk û siyasî de ne pêkan e ku encam bi dest bixin. Divê neyê jibîrkirin ku sedema ku QSD'ê ewqasî tê nîqaşkirin, armancgirtin û guftugokirin ji ber ku hêzeke bi bandor e.

## Pêvajoya Aştiyê



**Farûk Sakik**

Ev pêvajoya nû, piştî ku bi Rêber Apo re hevdîtin çêbû derbasî qonaxeke nû bû. Navek li vê pêvajoyê kirin. Pêvajoya Aşitiyê.
Peyva aşitiyê baştir e. Di navbera du aliyan de 40 sal e şerek heye. Ji bo ev bi dawî bibe hewldanên hene derbasî merhaleyeke nû bû. Hevdîtinên herdu aliyan dest pê kir. Çima di demekî wiha de pêdivî bi aşitiyê heye? Kurd ji bo dîrok xwe dubare neke divê xwedî helwestek çawa bin?
Serdema îro dişibe serdema Sewrê ya sala 1920'î. Di Sibata 1920'î de li Îtalya li bajarê San Remo ji bo aştiyê dema amadekariyan dest pê kir, li ser navê Kurdan dîplomatê Osmaniyan Şerîf Paşa hebû. Li Kurdistan hin kadroyên îtîhatçi, serekên eşîran û hin şexên Xalidî li dijî Şerîf Paşa bi rêxistin kirin. Li ser navê van kesan telgiraf şandin. Digotin Şerîf Paşa nûnerê Kurdan nîne.
Li hember vê yekê Cemiyeta Tealî ya Kurdistan jî, ji komîteya peymanê ya ku Fransa pêşengtî dike re, nameyek şandin û gotin ew telgirafên li ser navê eşîran hatine şandin sexte ne. Digotin ew name bi darê zorê bi wan dane îmzekirin. Piştre 2 nameyên girîg hatin nivîsandin. Yek ji aliyê serokê Cemiyeta Tealî ya Kurdistan a şaxa Sêwas-Zara-Îmraniyê Elî Şêr ve, ya dudiyan di 20'ê Adara 1920'î de ji aliyê Seyît Riza ve ji Fransiyan re hatibû nivîsandin. Di herdu nameyan de ji bo doza Kurdistan gelek pêşniyar, daxwaz û midaxle tê xwestin. Di dawiya nameyê de dihat gotin; Şerîf Paşa di 'peymana aşitiyê' de berdevkê Kurda ye. Di peymana Sewrê de piştî şerê cîhanê yê yekem Rojhilata Navîn dihat par ve kirin. Tirkan nedixwest Kurd bibin xwedî statuyek.
Îrojî dîsa li Rojhilata Navîn tevgerek parselkirinê heye. Tirk dîsa naxwazin Kurd bibin xwedî statuyek. Dewleta Tirk di sala 1920'î de hêviya xwe bi telgiraf û nameyên sexte yên kesayet û serek eşîran anîbû. Îrojî PDK û ENKS wek nûnerê Kurdan nîşan dide. Bi van hêzan re dixwaze pêşî li daxwazên Kurdan bigire. Lê îroj gelek Elîşer û Seyîd Riza (hêzên di bin sîwana KNK'e de) hene. Hemû Rêber Apo (Şerîf Paşa) wek nûnerpêşengê Kurdan dibîne. Her biryarên wî bênîqaşin.
Lê talûkeyek-xeteriyek-şêlîbûnek heye! Li Tirkiyê pêvajoyek bi navê aştiyê dane destpêkirin. Heger di navbera PKK'ê û dewletê de (herdu aliyên şer) aştî pêk were, ew ê vegerin ji cîhanê re bibêjin em li ser navê Kurdan jî li vê masê ne. Niyeta wan pêşîgirtina hêzên cîhanî ya piştgirî dide Kurdan e. Di peyamên rayedarên Tirkiyê de ku heta îroj tên dayîn de ev niyeta wan tê dîtin. Ev yek xeterî ye. Lê îro şansek Kurdan heye wê Rêber Apo pêşî li van leyîzkên wan yên veşartî bigire. Şerîf Paşa israr nekir û heta dawî di hevdîtian de nema. Rêber Apo bi israr e û tiştên ku Şerîf Paşa di nîvê de hiştiye bigihîjîne encamekê. Di şerê ku bi salan e didomê de, Kurdan ji bo azadiya welatê xwe, Tirkiye ji bo welatê Kurdan azad nebe, şer kirin. Heger îroj aşitiyek pêk were, divê doza Kurdistan çareserbibe û divê Tirkiye doz û hiqûqa Kurdan qebûl bike.
Her wek ev qebûl kirine wa heyet di nav liv û tevgerê de ne. Dixwazin, civaka ku bi salan e fêrî çanda şer bûye, ji wateya peyva aşitiyê dûr ketiye, di nijadperestiyê de israr dike, hêviyên ku şikestine fêrî aşitiyê bikin. Di civakê de hişmrendiyek çêbûye. Dibêjin heger ev heyet-qasid Rêber Apo şandibe wê her tişt baş bibe.